# XANEDANIYA CANPOLATAN Û DEWLET AVAKIRIN CERIBANDINA ELÎ PAŞAYÊ CANPOLATZADEYÎ

Eyüp Kıran
**Vekoler u Nivîskar - Dîyarbekir/ turkiye**

**Kurte:**

Di rojhelatanavîn de di pey Ereb, Faris û Tirkan re etnîsîta herî mezin Kurd e. Tê zanîn ku Kurd piştî Dewleta Eyûbîyan re nekarîbûn nuhve dewletekê mayinde ava bikin. Hin xanedanên Kurdan bi hukmê eşîran hebûna xwe li cûrbecûr heremên Kurdistanê domandin. Beşek girîng ji van xanedanan piştî şerê Çaldiranê (1514) re di bin hukumraniya Împeratoriya Osmanî de rêveberiya xwe bi statûya yurtluk-ocaklık domandin. Yek ji van xanedanan jî Xanedaniya Canpolat bû. Navenda wan şarê Kîlîsê bû. Endamê dawiyê yê vê xanedaniyê Elî Paşa (1605-1607) postê mîrêmîraniya Helebê bi zora xwe zeft kir. Heta Dimeşk jî xiste bin hukmê xwe. Bi Şêxên Lubnanê û Durziyan re tifaq çêkir. Osmanî nekarîbû manî be. Elî Paşa îjar xwest ku dewletek serbixwe ava bike, loma bi hinek dewletên Ewropayên yê wê demen re têkiliyên dîplomatîk danî û ji wan çekê agirîn xwest. Helep wê hîngê jî ji bo Ewrûpîyan navenda bazirganiyê bû.

Osmanîyan nêta Elî Paşa fêm kirin. Wê hîngê wezîrêazam yê Osmanî Kuyucu Murad Paşa bû. Kuyucu Murad Paşa şerê bi Ewrûpiyan re û bi Şahê Safewiyan re rawestand, ji bo têkbirina dewletavakirina Êlî Paşa dest bi tevdîran kir. Kuyucu Murad Paşa arteşa Osmanî ji bo seferê amade kir, şûn de bi rê ket. Kuyucu Murad hetanî Çiyayên Torosan nêta xwe eşkere nekir, dihat zanîn ku diçe ser Safewiyan. Çiyayên Torosan derbas kir şûn de avêt ser herêmên Canpolatan. Tarsûs û Edene zeft kir şûn de li Çiyayê Amanosan nêzîkê Îskenderûnê di gelîyakê asê de hatin hemberî hev. Artêşa Canpolatan giş sekbânên siwarî bûn. Bi artêşa Osmanî re him tivink hebûn û him jî topê cahnimê hebûn. Di gelî de bi teqîna topên cahnimê re hespên artêşa Canpolatan terqiyan û têk çûn.

Di pey têkçûna artêşa Canpolatan re, Kuyucu Murad Paşa li Efrînê, Deşta Cûmê, Kîlîsê û Helebê komkujîyên mezin çêkirin.

Êlî Paşa reviya Berriya Ruhayê ku ji xwe re ji eşîrên Milan nuh ve artêşekê çêke, lê li wir nêt guherî û çû Asîtanê (Konstantînopolê). Elî Paşa berî hatina Kuyucu Murad Paşa derket huzûra Siltanê Osmanî Ahmedê I. (1604-1617). Siltan Ahmed ew efû kir û kir waliyê Temeşwarê ku anuka wilayetek Romanyayê ye. Xelkê bajêr û yengîçeriyan nehîştin Êlî Paşa hukmê xwe li wir bajo. Êlî Paşa ji ber yengîçeriyan reviya Belgradê. Êlî Paşa di sala 1611an de bi fermana Vezîrêzam Kuyucu Murad Paşa ve li wir hat îdamkirin.

**Peyvên Sereke:** *Canpolatzadeyan, Elî Paşayê Canpolatzade, Kuyucu Murad Paşa, Sencaxa Kîlîsê, Mîrêmîraniya Helebê.*

**Destpêk:**

Di dîrokê de peşdirên Kurdan û Kurdan bi hêza eşîran û konfederasyonên eşîran mîrekî û dewlet ava kirine. Mînak Dewleta Mîtanî, Ûrartûyî û Medî konfederasyonên eşîran bûn. Bingehê Dewleta Merwaniyan û Hezbaniyan jî konfederasyona eşîran bûn.

Eşîr û konfederasyonên eşîran ji bal mîran ve dihat rêvebirin. Mîreyî ji bavan derbasê lawan dibû. Ji wan re xanedan tê gotin. Dîwanên mîran hebû. Rîsipî(pîr) û şêx jî endamên dîwanê bûn.

Selahedînî Eyûbî (1137-1193) di sala 1171î de Dewleta Misir û Sûriyê ava kir. Di pey mirina Wî re dewlet di nava law û birayên wî de dabeş bû. Memlûkên Misrê di sala 1250yî de dawî li dewleta Eyûbîyan anî.

Di pey Dewleta Eyûbiyan re Kurdan mîrekî ava kirin, lê nekarîbûn dewletek mayinde ava bikin. Car carna ceribandin lê nekarîbûn serkevin. Ji wan ceribandinan yek Elî Paşayê Canpolatzade ye. Mijara vê xebatê Mîrgeha Kilîsê û xanedaniya Canpolatzadeyan û Elî Paşayê Canpolatzade ye. Coxrafiya wan, ezbeta wan, dîroka wan û serpêhatiya mîrê dawiyê Elî Paşayê Canpolatzade û dewlet avakirin ceribandina Wî dê bê vegotin.

**Çavkaniyên Bingehîn li ser Mîrgeha Kilîs û Canpolatzadeyan:**

Çavkaniya bingehî Şerefnameya Şerefxanê (z. 1543, Qûm - 1603? Bidlîs) e. Şerefxan di berhema xwe de dûrûdirêj qala mîrgeha Kilîsê, Mîr Canpolat û Hûsênê Canpolat dike û pesnê wan dide. Lê nayê zanîn ku derheqê vê mijarê de jêderen Şerefxan çine? Dibe ku Şerefxan û Husênê Canpolat hevûdu pir dîtibin, bi hev re çûbin seferên leşkeriyên Osmanî û li Stenbolê hevûdu dîtibin. Şerefxan boyî di Şerefnameyê de cî bide Mîrgeha Kilîsê û serpêhatiya wan jê pirs kiribe.

Hichi (1973) di berhema xwe ya bi navê 'La Famille des Djoumblatt du VIIe. Siécle a Nos Jours' de serpêhatiya Canpolatan vedibêje. Xebatek akademik e. Hichi, bêyî Şerefnameyê ji Muhibbi, M. û Shidiak Sh. T. zanyarî wergirtiye.

Griswold (1983) di berhema xwe ya bi navê 'The Great Anatolian Rebellion' û Barkey (1994) di berhema xwe ya bi navê 'Bandits and Bureaucrats The Ottoman to State Centralization' de bi dorfirehî serhildana Elî Paşayê Canpolatî vedibêjin.

Û arşîwên Osmanî yên dî pey 1516an re derheqê Mîrgeha Ekrad û Xanedanîya Canpolatan de gelek zanyarîyan dîden.

**Kurte Dîroka Mîrgeha Kilîsê û Mîrêmîraniya Helebê:**

Kilîs anuka wilayetek Dewleta Tirkiyê ye. Kilîs hetanî 1995a qezayek wîlayeta Entabê bû. Li başûra wê Çiyayê Kurmênc û li rojavayê wê Çiyayê Amanosan heye. Navbera Kilîs û Entabê 55 km, navbera Kilîs û Efrînê 40 km û navbera wê û Helebê 112 km ye. Kilîs germiyan e, zivistanê berf nabare, bibare jî erdê nagre. Loma ev dever ji zemanên kevn de zivistanê zivistangeha koçeran bû. Pêşdirên Canpolatzadeyan ew navçe ji xwe re kirin paytext şûn de pir mezin bû anuka wilayet e.

Ji bo avabûyina Mîrgeha Kilîsê bê zanîn, gerek em ji dîroka serê sedsala 11an de dest pê bikin. Xîlafeta Ebasiyan ji bo bacgirtinê û leşker temînkirinê zordestî li Kurdan dikirin. Kurdên ji ola Îslamê re baweriyên wan qels bûn, yan jî li ser dînê xwe bûn nedixwestin bacê bidin û leşker bidin arteşa Ebasiyan. Wexta artêşa Xelîfeyan ji Bexdayê dihate ser wan ew direviyan çiyayên xwe, yan jî Berriyê. Ji aliyê hêzên Xelîfeyê Ebasiyan ve berê berê Hemdaniyan ji Mûsilê û Mêrdînê hatin tunekirin, Kela Hesiniyan hat xirabekirin, di pêy re Mîrdasinyan-Dasinîyan tevê êla xwe ji Bêhdînan hatin derxistin. Di

salên 833 û 834an de Xelîfeyê Ebasî du cara avêtin ser Dasinyan (Bozanî, 2011)[1]. Di sala 895an de Xelîfe Mutazid çû Mêrdînê ser Hemdaniyan. Vegerê di navbera Mûsil û Cîzîrê de Kela Hesinyan xirabe kir (Yılmaz, 2006)[2].

Mîrdasinyan di sala 1024an de Heleb zeft kirin û desthilatdariya xwe ava kirin (1024). Lêbelê di sala 1080yî de dawî li hukumraniya wan hat. Di sala 1086an de Siltanê Selçûkî Mêlîkşah hat Heleb teslîm girt û Aksungur tayinî walîtiyê kir. 1094an de desthilatdarê Şamê,Tûtûşê Alparslan di pey mirina birayê xwe Mêlikşah re ji bo postê siltaniyê Aksungurê waliyê Helebê kuşt. Tûtûş bi birazyên xwe re şer dom kir û li Îsfehanê hate kuştin, lawê wî Ridwan bû mîrê Helebê.

1097an de artêşa Xaçiyan ya Sefera I. di ser Anatolyayê re hate rojavayê Kurdistanê, Sûryê, Lubnanê û Filîstînê. Xaçiyan li Entakyayê, Ruhayê, Trablûsgarbê hukumatên xwe ava kirin. Kontê Ruhayê ji Mereşê hetanî Nisêbinê da ber xwe. Artêşa xaçiyan koçer û akinciyên Kurd talan dikirin. Koçer û akinciyên vê deverê nekarîbûn li ber xwe bidin.

Gorayê Kazwînî di serê sedsala 12an de 400 eşîrên Kurd ên herêma Şamê ji ber zulma xaçiyan ji wir bi neçarî koç kirin Îranê herêma Bextiyarî û Îsfehanê. Bi giranî ew eşîrên Milan bûn.

Heger Ûrtekiyan (Dugirniyan ku ew jî ji eşîrên Milan bûn) û Selçûkiyên Romê li dijî xaçiyan li ber xwe dabin jî tu havilek bi dest nexistin. Lê Îmadeddîn Zengîyê lawê Aksungur ku waliyê Mûsilê bû (1127-1146) 1128an de hat Helep zeft kir, 1144an de jî Ruha zeft kir. Yanê ji Mûsilê hetanî Entakyayê hemû Berrî ket bin kontrola Zengî. Zengî 1146an de hate kuştin. Lawên wî Nûredîn Mahmûd û Seyfedîn ji bo xaçiyan ji qeraxa Derya Spî derbixînin tekoşiyan.

Eyûbiyan bi destûr û fermana Xelîfeyên Ebasî desthilatdarê Tikrîtê bûn. Ji ber hinek pirsgirêkan navbera wan û xelîfe xirab bû. Xelîfe ew qewirandin. Eyûbiyan bi hêza xwe tevî Zengîyan bûn.

Zengîyan û Eyûbiyan bi zor û bi xweşî bi mîrên eşîrên Kurdên: Hedbaniyê, Zerzeriyê û Humêydiyê re li hev kirin, ew tabiî xwe kirin û ji wan hêz girtin (Sallabî[3], 2014; James[4], 2011).

Di pey mirina Nuredîn Mahmûd Zengî re Selahedîn Eyûbî bû Siltanê Misrê (1171). Di pey mirina Selahedîn Eyûbî re (1193) dewlet dabeş bû. Ji xwe Selahedîn di saxiya xwe de Heleb ji destê zaroyên Zengiyan wergirtibû û lawê wî Mêlik Zahîr bûbû siltanê Helebê. 1216an de Mêlîk Zahîr mir, Deyfe xatûnê hukum dikir.

**Avabûyina Mîrgeha Kilîsê:**

Gorayê Şerefnameyê[5] Mîr Mend (Menteşa) tevî eşîra xwe ketiye xizmeta Eyûbiyan. Eyûbiyan li devera Çiyayê Kurmênc cî daye wan. Berevacî vê Reşo (2014)[6] navê Mend bi şêxtiyê hildide, gorayê wî yê Mîrgeha Kilîsê damezirandiye Şêx Mend e. Rind nayê zanîn ku Mîr Mend, yan jî Şêx Mend kengê hatiye ketiye xizmeta Eyûbiyan. Wisa xuya dike ku mîr li Kilîsê bûn, şêx li Çiyayê Kurmênc bûn. Mîr û şêx carna bi hev re bûn, carna li dijî hev bûn.

Di sala 1250yî de Eyûbî têk çûn û dewleta Eyûbiyan ket destê Memlûkiyan (1250-1517). Tew ser da îjar ji rojhilat da Moxolî hatin Anatolyayê û Selçûkiyên Romê xistin bin kontrola xwe. Moxolan 1260î de Heleb zeft kirin û komkujî çêkirin. Ji bona rojavayê Kurdistanê û Sûriyê Moxolan û Memlukiyan pir şer kirin. Memlûkiyan bi Moxolan re rind tekoşiyan, şerê Eyn Celûtê jî di nav de gelek caran li dijî Moxolan bi ser ketin. Herêma Kilîs

û Çiyayê Kurmênc di nava herdu hêzan de wek tamponek bû. Moxolî di dawiya sedsala 13an de êdî bê tesir bûn. Îjar di dawiya sedsala 14an de Temirleng bi ser Osmanî de hat Anatolyayê û Kurdistanê û Sûriyê. Di pêy wî re di sedsala 15an de Aqqoyûniyan tahm nedan bakur û rojavayê Kurdistanê. Em nizanin li hember van hêzanan Kurdên Mîrgeha Kilîsê û Çiyayê Kurmênc çawa xwe parastine.

Di sala 1507 an da Siltanê Memlûkî Qansû Gawri û artêşa Mîrekiya Remezaniyan bi hev ra avêtin ser Kurdên Mîrgeha Kilîsê. Serwerê Ezdiyên Çiyayê Kurmênc jî Şêx Izedîn tevî wan bû. Mîrê mîrgeha Kilîsê Qasim bihîst ku bi ser wî da tên, li Çiyayê Sehlûnê kêmîn danî ber wan. Wexta artêşa Misrê kete kêmîna wî, êriş birin ser artêşa wan. Artêşa Misrê têk çû û belav bû. Mîr Qasim di pey şer ra bi Şêx Izedîn ra li hev hatin. Ji vê şûnda nakokiya di navbera Kurdan û Siltanên Memlûkiyan da hetanî hatina Siltan Selîmê Osmaniyan dewam kir, lê mîr û şêxên Kurdan serî li ber wan netewand.

Wê demê terîqeta Şêx Adî (1072-1162) ji Şengalê hetanî Hemayê belav bûbû. Gorayê Reşo[7] Mîrgeha Kilîs û Helebê wek Mirgeha Şengal û Mîrgeha Şêxanê kevintirîn mîrgehên Êzîdiyan e û ji heft Sinceqên ola Ezdî yek jê Tawsa(Sinceq) Helebê bû.

Wexta Siltanê Osmanî Selîm di sala 1516an de hate sefera Misrê, Mîr Qasim çû pêşwaziya Wî.

Di 24ê Tebaxê de artêşa Misrê û ya Osmanî li Mercîdabikê şer kir. Memlûkiyan têk çûn û Siltanê Misrê Qansûh Gawrî mir. Selîm di 28ê Tebaxê da hat ber Helebê. Helebiyan xwe avêtin ber Siltan Selîm ku leşkerên wî bajêr talan nekin. Siltan Selîm ji bo talannekirina bajêr ferman da leşkerên xwe. Siltan Selîm Qerece Paşa kir waliyê Helebê û Çomlekçizade Kemal Çelebi jî kir qadiyê Helebê[8].

Siltan Selîm dî 28ê Îlonê de hate Dimeşqê. Di 22ê meha Çileya Paşîn a 1517an de li Ridaniyeyê artêşa Osmaniyan û artêşa Memlûkiyan dîsa şer kirin. Siltanê Memlûkiyan Tomanbayê birazyê Qansûh Gawrî bû. Artêşa Memlûkiyan têk çû. Siltan Selîm di 4ê Sebata 1517an de kete Qahîreyê. Bi vî hawayî Dewleta Memlûkiyan ji holê rabû.

Wexta Siltan Selîm vegerya, Mîr Qasim û kurê wî Canpolat (deh-donzde salî) bi xwe re birin Stenbolê. Eşkereye ku ew rehîn girtine. Siltanê Osmanî Selîm, Qasim li Stenbolê kuşt û Canpolat jî şand mekteba enderûnê perwerdeyê.

**Di Nava Îdarî Sîstema Osmanî de Avabûyina Sencaxa Ekradê:**

Gorayê arşîwên Osmanî Kilîs di tahrîrên 1519an de nahîye ye, 1527an de bû Sencaq û mîrê wê Şêx Îzedîn e. Loma ji Kurdên wê deverê re dibên Ekrad-ı İzeddinlu. Sencaqa Kilîsê gorayê îdara Osmanî **Ocaqliq** bû. Yanê mîreyî ji bav derbasê law dibû. Sancaxa Ekradê ji Kilîs, Deşta Cûmê, Ma’ara û Ezazê pêk dihat. Ev dever zivistanê cîhê koçeran bû. Koçerên **Silêmanî (Berazî)**, **Izedînlî** û **Mûsabeglî** sereke bûn. Navenda Deşta Cûmê Gundê **Cindirîs** bû.

Şêx Izedîn 1547an da wefat kir û lawên wî tunebû, yanê. Ewilî yekê bi nav Bûdaq Beg bû mîrê Kilîsê, paşê jî Canpolat bû mîrê Kilîsê.

Gorayê arşîwên Osmanî 1550an de Heleb Wilayet bû, Kilîs jî sencaq bû. Helbet mîrê Sencaxê jî Canpolat bû.

**Serpêhatiya Canpolatê Qasim:**

Peçevî derheqê Canpolat da wiha dinivisîne: “Ji Kurdên serbixwe lawê Qasim Begê ye. Wexta ew derxistine ber Padîşah, rihmetî guhên wî yên bi guhar mizdaye û şandiye harema xwe. Wexta keleşên Kurd derdora Helebê dişewitandin û xirabe dikirin,

mîrektiya Sencaxa Kilîsê bi hawayê ocaxtiyê dane Canpolat Beg. Wexta çû ser erka xwe keleş û rêbirên wê herêmê qelihandin.”

Di sîstema Osmanî de mîrên sencaxa du erkê wan hebû: yek îdarî û ya din leşkeri bû. Canpolat jî bû mîrê sencaxê şûn da li herêma xwe berêberê dizî, talan û şêlandin qedand, li hember rêbir û şêlandinan tekoşînek dijwar meşand.

Di sala 1565an de li Şatu’l Erebê, Eşîra Binî Ulyan li hember Osmanî serî hilda. Ji bo islehkirina wan, Osmanî Mîrêmîranê Diyarbekir Îskender Paşa tayînî Bexdayê kir û jî bo sefera ser Binî Ulyan erka serdarîyê dayê. Desthilatderê Amêdîyê Mîr Husên û mîremîranê Şahrezorê Mûzefer Paşa jî bi erkdarî tevî vê sefere bûn. Osmanî, Mîr Canpolat jî vazifedar kir ku ew 300 keştiyî çê bike, tije serbaz bike û bi riya Robarê Ferêt re tevî sefere bibe. Cih û warên Binî Ulyan giravên nav Şatu’l Erebê bû, mirov ancax bi keştiyan dikarî bû xwe bigihijînê.

Mîr Canpolatê Qasim, li Birecûgê 300 keştî dan çêkirin, lê paşê 100 keştiyên din jî da çêkirin, çunkî leşker û zexîre ancax radikir. Leşker û zexîre bi van keştiyan hate veguhestin berbî Besrayê. Ji bo keştiyan bêrikkêş jî ji herêmê hat neqandin.

Gorayê nivîsandina Çelik [9] ku ji Katîp Çelebî û ji Mehmed bin Mehmed veduguheze; Mîr Canpolat bi 2.000 leşkerê yêngîçerî, 200 topçî û ji Kilîs û derdora Helebê 6.000 leşker ve 1567 an de ji Birecugê bi rê ketiye. Mîr Canpolat û serdar Îskender Paşa li Hileyê hevûdu dîtin şûn de ew jî bi riya bejayê meşya û li Kela Zirtokê gihîştin hev. Canpolat leşkerê xwe derxist Girava Sadru’l Bahranê û şer dest pêkir. Ereb têk çûn û grav ket destê Osmaniyan. Osmanî li herdu hêlê avê Kela ava kirin û ji bo ku Erebên Binî Ulyan teslîm bibin derên wanên xurmeyan ji kok de birîn. Darê xurma debara Binî Ulyanan bû. Binî Ulyan û Erebên wê deverê ji serfermanderê artêşa Osmaniyan eman û aşitî xwestin û bi Osmaniyan re li hev hatin. Canpolat di pey lihevhatinê jî hinekî li wan deverana û Bexdayê awiqîye û 1568an de hatiye Kilîsê.

Mîr Canpolat 1570yî de bi artêşa Osmanî re tevî sefera Qibrisê bû. Leşkerê wî nivê pir tîrkêş bû. Osmanî bi zanebûn jê tîrkeş xwestibûn. Di zeftkirina Lefkoşeyê û Magosayê de pir jêhatî bûye, loma Tirka li Magosayê li ser navê wî muze çêkirine.

Gorayê Çelik[12], Mîr Canpolat di navbera salên 1575-1582an de rehmet kiriye. Tirba Canpolat li Kilîsê ye.

Canpolat li Kilîsê qesr û qonax, mizgeft, medrese, hemam, tirb, bedesten, xan, karwanseray, dikan û şadirwan jî ava kirine. Di wêneyê jêr da Mizgefta Canpolat (Tekya) xuya dike ev avahî bi nav û denge, şahesere ke.



**Zaroyên Mîr Canpolat**

Gorayê belgeyên destketî, lawên Canpolat, gorayê temenên xwe wiha rêz dibin: **Hebîb**, **Emer**, **Ahmed**, **Evdila**, **Husên**, **Cafer**, **Heyder**, **Xidir** û **Zeynel**.

Canpolat qedr û qîmet daye perwerdeyê ku zaroyên xwe rind perwerde kirine, lê gorayê Şerefxan[10], Canpolat Beg, gelekî li ser perwerdeya kurê xwe yê pencemîn Husên sekiniye û ji bo têgihîştina wî gelek ked serf kiriye.

Canpolat di 1574 an da xwe malnişîn kir û postê mîrektiya Sencaxa Ekradê dewrî lawê xwe yê biçûk Cahfer kir.

Gorayê Şerefnameyê[11]: Cahfer wesîyeta babê wî hat cîbicî kirin û li ser fermana pîroz a Siltan Mûrad Xan li ser Fermanrewatiya Kilîsê rûnişt. Hê tenê çar sal di ser fermanrewatiya wî re darbas bûbû, dema ku Lala Mistefa Paşayê serdar, bi leşkerê Osmanî ve ji bo girtina Şîrwanê kete rê, Cahfer Beg jî li pey leşker berbî Diyarbekirê ve hereket kir. Dema ku gihîşt Qerejdaxe ji ser hespê da ket û ruhê xwe teslîmî xwedayê xwe kir(1579).

Di pey mirina Cahfer re di sala 1579 an de Emer de bû mîrê Sancaxa Kilîsê. Cahfer jî di sala 1582an de mîretiya Sencaxa Kilîsê dewrî birayê xwe Husên kir.

Çaxa Husên Beg hîn mîrê Sencaxa Ekradê bû, bi fermanekê bû mûhafizê mîremîranê Helebê.

Husên çaxa di mîritiya bavê xwe Canpolat da 1566an da ew jî tevî Sefera Osmanî ya ser Zîgetwarê bûbû. Wê hîngê mîrên Kurdan bi artêşên xwe tevî seferên Osmanî dibûn. Ji ber vî karê xwe yê leşkerî bi artêşa Osmanî ra 1578an da tevî sefera Îran û Gurcîstanê jî bûbû.

1581an da mîrê Helebê bû. Husên li ser mirina bavê xwe, birayê xwe Cahfer û di pey ra jî li ser mirina Emer ra di 1582 an da bû mîrê Sancaxa Ekradê. Berî bibe mîr, li Şamê leşkerê sîpahî bû. Mîr Husên bû erkdarê Sancaxa Ekradê şûn da di demek kurt da hukmê xwe xurt kir. Du sal şûn da bi **Sînan Paşayê Çîgalazade** ra li hember Şahê Îranê Muhemed Xudabenda ra wek fermanderê duyemîn şer kir.

Gorayê dîroknivîsên Tirkan di pey vê demê ra bi sedemek ne diyar ve Osmanî zaroyê Canpolat ji Kilîsê dûr xistin û desthilatdarî dan yekî bi navê wî **Dêw Sulêyman**. Osmaniyan Husênê Canpolat li Helebê avêtin zîndanê û dest danîn ser mal û mulkên wan. Mal û mulkê wan berbiha hat firoştin.

Demek şûnda Husên ji hefsa Helebê hat berdan, li wir nesekinî hat Kilîsê. Saya sekbanên bi wî ve girêdayî mal û milkê xwe ji Dêw Sulêyman şûn da wergirt. Dewleta Osmanî ji vê hewildana Husênê Canpolat nerazîbe jî eger bac û daylana xwe da şûn da mudaxele nekir.

Gorayî ku mîrê Kurdan Husênê Canpolat hewqas wêrek bû, comerd bû, siyaset zanî bû, xizm û merivên xwe li dora xwe civand. Xatirê alîm û mumînan jî rind zanî bû. Çunkî ew bi xwe jî alîm bû, di zaroktî û ciwaniya xwe da bi ilmê asmanî û stêrkan perwerda bûbû. Ji bo maaş û lêçûna sekbanên xwe baca ser xelkê zêde kir, xelkê nerazîbûna xwe nîşan da. Lê paşê li herêmê bi hêza xwe rêbirîn, şêlandin, talan û şeqawet qedand, aramî û ewlekarî temîn kir, milet jê hez kir. Nav û dengî wi belav bû.

Mîr Husên li Ezaz û Kilîsê gelek gund li ser navê xwe ava kirin. Gund û erdên wî yê cotkariyê bêhesab bûn. Dahatîya wî ya salane 803.000 akçe bû ku Osmanî di xwest wî bi wezîr ke[12].

Bajarê Helebê gelekî dawlemend bû. Navenda eyaletekê ku dahata wê bêhed bû. Eger Husênê Canpolat karîba vê dahatê kontrol bike wê bi hukumdarekî mezin be.

Husênê Canpolat pir baqil û jêhatî bû. Nedixwest ku Osmanî xwe jê xwî bike. Bi dilê wî nibe jî baca Dewleta Osmanî bê pirsgirêk dida.

1599 an da Hukumata Osmanî ji Husênê Canpolat him pere xwest û him jî bi leşkerê xwe biçe ser Evdilhelîm Qere Yazicî. Wexta Husên çû Ruhayê ser Evdilhelîm Qere Yazicî, sekbanekî îsyankar bi navê Rustem avêt ser Kilîsê. Ketxudayê Husênê Canpolat yekî bi navê Ezîz bû, ji mîremîranê Helebê Heramî Ahmed Paşa yarmetî xwest. Yarmetî nehat, Ezîz bi hêzek biçûk li berxwe da, lê di şer da hat kuştin. Rustem Kilîs talan kir. Wexta Husênê Canpolat ji dorpêçkirina Ruhayê vegerya, rewşa Kilîsê dît eyn dîn bû. Vê ra bi pey Rustem ket, zeft kir û kuşt.

Osmanî 1603-1604 an da Nasûh Paşa kir waliyê Helebê. Nasûh Paşa hîn nuh li cihê xwe rûniştibû ku leşkerê Dimeşqê xwe da ber deriyê Helebê. Nasûh Paşa zanîbû, bi serê xwe nekare bi serkeve, ji Husênê Canpolat alîkarî xwest. Husên vê ra birazyê xwe ku zavê wî bû, Elî Canpolat şand Helebê. Leşkerê Dimeşqê di yek şevê da şûn da vegerya. Elî Canpolat û Nasûh Paşa bi pey leşkerê Dimeşqê ket û ew li Gundê Kefr Tayî qefilandin û têk birin.

Nasûh Paşa bi eslê xwe ji Gumulcîneyê bû û dewşirme bû. Osmanî ew perwerde kiribû. Nasûh Paşa gerek sipasiya xwe bikira, lê ew fikirî ku va artêşa Elî Canpolat di pêşerojê da ewê jê ra xeter be. Nasûh Paşa serda bi keça Husênê Canpolat ra jî zewicî, lê zewac neçû serî, hevûdu berdan û keça Husên çû mala bavê xwe. Nasûh Paşa cihêz û malên keça Husênê Canpolat şûn da venegerand. Nasûh Paşa dixwest ji hêza dewletê îstifada bike û Husênê Canpolat ji ber xwe da bixe.

Wisa xuya dike ku Husênê Canpolat ev nêta Nasûh Paşa rind fahm kiribû. Loma agahî da serderê Rojhilat Çîgalazade Sînan Paşa û jê alîkarî xwest. Çîgalazade Sînan Paşa jî dixwest ku Husênê Canpolat taltif bike, loma Nasûh Paşa ji walîtiya Helebê xist û Husênê Canpolat tayini walîtiya Helebê kir. Çîgalazade Sînan Paşa hevalên hevên şer bûn. Husênê Canpolat zûtirkê leşker û sekbanên xwe dan hev. Nasûh Paşa jî bihîst ku Husênê Canpolat ji Çîgalazade Sînan Paşa ra xeber şandiye, wî jî ecele kir û artêşa xwe girt û hat ser Kilîsê. Li nêzîka Kilîsê li hev rast hatin û bi hev ra şer kirin. Nasûh Paşa têk çû. Nasûh Paşa vegerya Helebê ku hêza xwe nuhveke. Fermana Çîgalazade Sînan Paşa gihîşt Nasuh Paşa ku ew erka xwe berde û postê walîtiyê bide Husênê Canpolat. Nasûh Paşa erka xwe berneda û li ber xwe da. Gorayê wî gerek Seray vê fermana Sînan Paşa erê bike û bi nivîskî bigihîje ber destê wî. Yanê hetanî erêkirina Serayê negihîjê ewê meqama xwe bernede. Nasûh Paşa di binî ra jî nameyek ji seraya Osmanî ra şandibû, wî bawer dikir ku fermana serayê di lehê wî da were, loma hetanî jê dihat li ber xwe dida. Dibê gotiye “Eger çîprûtekî reşik bianiyana minê bipejiranda, li ez bi Canpolatzada razî nabim”[13].

Li ser vê rewşê Husênê Canpolat jî ket şikê ku ji serayê biryarek di eleyhê wî da were. Wê hîngê hukumdariya wî, can, mal û milkê wî hemû di bin metirsiyê da bû. Gerek bi hêza xwe here ser Helebê, bi Nasûh Paşa re şer bike û êdî bi zor be jî bibe xwediyê postê mîrêmîraniya Helebê. Bi gotina Koçu[14], Çîgalazade Sînan Paşa ji Husênê Canpolat ra wiha gotiye: “Eger wilayet teslîmî te nekir, bi leşkerê xwe ve biçe ser.”

Husênê Canpolat bi hêza xwe çû ser Helebê. Li hinda gundê Heilanê li hev rast hatin. Nasûh Paşa şûn da vekişya û tevî leşkere xwe ket nav Kela Helebê. Husênê Canpolat Heleb dorpêç kir. Dorpêçkirinê dirêj ajot. Bazirgan û xelkê Helebê ket tengasîyek mezin. Li Helebê bazirganî sekinî, reaya nekarîbû tevbilive, biçe karê xwe. Di hundurê bajêr da xela çêbû. Qadiyê Helebê Mahmûd Şerif ket navberê û rewşek aşitiyê sax kir. Nasûh Paşa derket çû, Mîr Husên li postê mîremîraniya Helebê rûnişt.

**Kuştina Mîrêmîran Husênê Canpolat:**

1605an da Çîgalazade Sînan Paşa biryar da ku hêzên Kurdistanê, Sûriyê û Anatolyayê bicivîne serhev da ku li hember Şah Ebasê Safewî serkevtinek gewre bi dest bixin. Çîgalazade Sînan Paşa ji bo sefera ser Safewiyan ji Husênê Canpolat xwest ku tevî hêza xwe were tevî wî bibe û ji xizna xwe jê ra pere jî bîne.

Husênê Canpolat hêzek ji Kurdên piyade pêş da şand, lê li hêviya destûra mîrêmîraniya Helêbê ji paytexta Osmanî were pa. Du hîv şûn da destur hat. Husênê Canpolat hêza xwe tevkir, wekaleta xwe da birazyê xwe Elî Canpolat û bi rêket çû sefera Îranê.

Husênê Canpolat hetanî gihîşte Wanê şer qedya bû. Çîgalazade Sînan Paşa stratejî û taktîkên ne li rê şopandibûn. Çîgalazade di dema şer da afyona xaşxaşê dikişand û di konê xwe da radiza. Mîrên Kurdan dixwestin ji bo birêvebirina şer da pêşniyarên xwe bibêjin. Nobedaran nedihîştin ew bigihîjin hinda Sînan Paşa. Yêngîçerîyan jî gotiye belkî Sînan Paşa mîna cara berê ji şer revyaye. Û yêngîçerî jî ji meydana şer revyan. Artêşa Osmanî têk çû. Çigalazada bi zor canê xwe xelas kir. Nêzîka 30.000 leşkerê Osmanî mir, gelek jî dîl hatibûn girtin. Çîgalazade xizna xwe, xenîmetê ku bi destxistibûn û 60 top li qada şer hîştibû.

Husênê Canpolat li qeraxa Gola Wanê li Kurdên ku ji şer şûn da bi halekî perîşan vedigeriyan rast hat. Wan ji Husên ra got ku di şer da têk çûn û serdar jî revyaye. Husên bi wan ra şêwirî şûn da çû Wan ê. Husênê Canpolat bi hêzên xwe du cara berê li kêleka Çîgalazade Sînan Paşa tevî seferên Îranê bûbû. Husên digot belkî Osmanî yê dîsa hêzên xwe bi hev de û biharê biçe ser hêzên Safewiyan. Husên bi hêza xwe li Wanê li benda Çîgalazade Sînan Paşa pabû. Çîgalazade wexta bi birînderên xwe gihîşte Wan ê û baregeha Husênê Canpolat dît, ji qahra dîn bû. Çîgalazade Sînan Paşa fikirî ku ji bo Husênê Canpolat bibe mîremîranê Helebê çuqas hewil dabû, lê anuka her tiştê xwe wenda kiribû. Gerek ji têkçûyina xwe ra sebebekê jî bidîta. Wexta ew destvala vegere paytexta Osmanî gumane ku Siltanê Osmanî dê wî bixeniqîne.

Çîgalazade Sînan Paşa li qesra xwe ya Wanê bi lez ban Husênê Canpolat kir. Griswold[15] ji weqanivîsa wiha veduguheze: Sînan Paşa ji Husênê Canpolat ra gotiye "Eyaleta Helebê bi soza ku tu bigihîje seferê me dabû te, ji bo çi tu negihîşt ser me?" Husênê Canpolat îfada xwe dabe jî Çîgalazade ew îdam kir. Koçu[16] wiha dinîvîsîne: "Sebeba têkçûyina me dereng hatina te ye, celat zû vî melûnî bixeniqînin." Dîsa Koçu ji vakanuvîs Naima Efendi veduguheze[17]: "Bêsûc, bêsebep Canbulatoğlu qetil kir." Gorayê Hammer[18] jî Sînan Paşa bi xwe Husênê Canpolat bi şûr kuştiye.

Griswold dinivisîne[19] "Ew biryarê bi lez, di jiyana meslega Çîgalazade Sînan Paşa da ji du şaşiyên mezin ya dudya bû û Osmanî ji bo sererastkirina vê şaşiyê pir pere xerc kir û xwîn rijand. Fermanderê herî bi qidem yê Siltanê Osmanî, Çîgalazade Sînan Paşa, fermana kuştina rêvebirê leşkerî û siyasî yê Kurdistana Rojava (Berriyê) dabû. Bi vê helwestê siyaseta Osmanî ya başûr têk çûbû û rê li ber îsyankarên Celalî vebûbû."

Fermandar û leşkerên Husênê Canpolat êdî ji Osmanî re şer red kirin, konê xwe berdan, pêçan, barkirin û berbi Berriya Kilîs û Helebê bi rê ketin. Çîgalazade Sînan Paşa jî ew nedan sekinandin. Ji xwe nekarîbû bisekinanda. Pêşî zivistan bû, artêşa xwe ya mayî belav kir û vekişya Diyarbekirê. Sê meh şûnda li Diyarbekirê mir.

Gorayî erf û edatên Kurda gerek Elî yê Canpolatî heyfa apê xwe bistenda. Husênê Canpolat him apê wî bû û him xezûrê wî bû. Loma fedayiyên xwe hazir kirin ku herin li

Diyarbekirê Çîgalazade Sînan Paşa bikujin. Lê Çîgalazade Sînan Paşa 1606an da li Diyarbekirê mir. Hinek dibên ji qahra miriye, hinek dibên wî xwe bi toza elmasê jahrdadayî kiriye.

Gorayê Griswold[20] "Dardakirina paşayê pêşdira eşîrek gran a Kurda bû sebeba serhildanek herî mezin. Armanca serhildana Canpolatzade ne wek serhildanên Celaliyan ji bo li dewleta Osmanî hevhatin bû, armanca wî ji bo dewletek avakirinê bû ku paytexta wê Heleb be."

**Hewildanên Elî Paşayê Canpolat:**

Elî Paşayê Canpolatî (1580-1610) li cem apê xwe Husênê Canpolat rind terbiye û perwerde bûbû. Li ser mirina apê xwe ew bûbû serokê herêmê. Ji xwe bi wekaleta apê xwe mîrêmîraniya Helebê dikir. Li hêviya Dewlet a Osmanî nesekinî, bêrîzaya wê çû li Helebê li ser postê apê xwe Husênê Canpolat rûnişt. Gorayê raportên Toskana yê yekî pir jêhatî bûye. Wekî padîşaha çû li Qesra Helebê rûnişt. Dafterdar û memûrên Osmanî ji kar avêtin û memûrên xwe xistin şûna wan. Yêngîçeriyên Helebê ku li hember wî bûn, berteref kirin. Di pey ra dest bi leşker nivîsandinê kir: ji Kurd, Ereb û Tirkmanan nêzîka 20-30 hezar leşker berhev kir. Leşkerê xwe bi nizama artêşa Osmanî peyade û siwarî kir du beşan. Artêşa wî sipehî û dewamî bû. Mihaş dida leşkerê xwe. Muhimat û lewazima wan temin dikir.

Osmanî ji ber karen xwe yên giran wê demê nekarîbû li ser vê helwesta Elî Paşa yê Canpolatî bisekiniya. Dibe ku Osmanî ji bo ku Elî Paşa yê Canpolatî aş bibe, serî hilnede û dest navêje derên din, yanê hîn mezin nebe, loma bêdeng ma.

Elî Paşa yê Canpolat li postê mîrêmîraniya Helebê rûnişt şûn da dixwest dewletek mezin ava bike. Malmezinên ji ezbeta Elî Canpolat hemûya piştgiriya wî kir. Hemû eşîrên Kurdên deverê jî piştgiriya wî kirin. Tirkman û Ereb jî li hember wî ranebûn. Çunkî ewlekarî hêbû, aramî hebû û bazirganî rind dibû.

Elî Paşayê Canpolatî ew karên xwe tekuz kirin şûn da dest bi erd fethkirinê kir. Wê hîngê li Sûriyê sê hêzên xurt li hember wî hebûn: yek li Lubnanê Mala Şêx Maan bû, yê din Mala Xarfûşê Baalbekê bû û yekî din jî Yûsûfê Seyfo yê mîrêmîranê Trablûsşamê bû. Elî Paşayê Canpolat zanî bû ku ji bo dewleta xwe gerek yan van hêzana bi aliye xwe xe, yan jî bi zorê ji ber xwe da bixe.

Paytexta Dewleta Osmanî jî piştgirî û alîkarî da Yûsûfê Seyfo yê mîrê Trablûsşamê ku li hember Elî Canpolat bi ser keve. Bi vê mebestê Osmanî rutbeya serdariya Dimeşqê da Yûsûfê Seyfo. Elî Canpolatî rewş fahm kir şûn da bi lez çû ser Yûsûfê Seyfo. Di Tîrmeha 1606 an da li Hema yê bi hev re şer kirin û Yûsûf bi halekî xirab têk çû. Yûsûf ji qada şer reviya û çû Trablusşamê. Hevgirtiyên wî xwe sipartin Elî Paşayê Canpolat. Elî Paşa jî xatirê wan girt. Nav û dengê wî li şêx û şûxên Ereban belav bû. Elî Canpolat qasid şand pey Şêx Fexredînê Maan. Elî Canpolat û Fexredînê Maan li qeraxa Çemê Asiyê li hev rûniştin û plana zeftkirin û îmha kirina Yûsûfê Seyfo kirin. Elî û Fexredîn xistin serê hev şûn da, Elî pismamê xwe Dewrêşê Hebîb şand ser Trablûssamê. Trablûşşamê li berxwe neda û ket. Dewrêş li kela hundur dest danî ser xizneyê, lê Elî Canpolatî ferman da leşkerê xwe ku kes ehlên Trablûşşamê talan nekin. Şêx û mîrên herêmê ji vê şefqat û helwesta Elî Canpolatî pir razîbûn ku hemûya piştgiriya wî kirin. Di wê navberê da hejmara leşkerê Elî Canpolatî gihîşt 60.000.

Yûsûfê Seyfo gihîşt Dimeşqê û hêza xwe dîsa xurt kir. Elî Canpolatî û Şêx Fexredîn bi hev ra berê çûn Baalbekê ser Mûsayê Xarfûş ku ew refîqê Yûsufê Seyfo bû. Merivekî Mûsa xistin bin postê wî û ew jî kirin refîqê xwe, şandin Dimeşqê ku leşker li dijberî Yûsûfê Seyfo rabe. Şêx Fexredîn, Akka, Heyfa û Kayseriye ji xwe re veqetand.

Elî Paşayê Canpolatî ji bo xwe û hevkarên xwena ji mîrêmîranê Dimeşqê Seyid Mehemed Paşa hinek dever xwestin. Ji bo Amrû el-Bedawî yê şêxê el-Mufariceyê, Hawrana başûra Dimeşqê xwest. Bi nivîskî, Geliyê Bekaayê ji Îbnî Fureyh Mansûr bin Bekrî re xwest. Yengîçêrîyekî ku merivê Fexredîn bû xwest ku li Dimeşqê dîsa biçe ser karê xwe yê berê. Herçuqas xwestekên wî red bûbe jî hevkarên wî bi helwesta Elî Paşayê Canpolatî kêf xweş bûn. Elî Canpolat, di binî ra ji bo dewletek avakirinê xebatên xwe dewam kir û ji bo baca dewleta Osmanî neşandinê ra jî bihane û lêborînên xwe peşkeş kirin. Ev fenên siyasî bûn wî bi kar dianîn.

Elî Paşayê Canpolatî bihîst ku Yûsûfê Seyfo dîsa li Dimeşqê ji bo şer hêzên xwe amade dike. Ew û Şêx Fexredînê Maan bi hêzên xwe çûn ber deriyên Dimeşqê. Elî Paşa zanibû ku Dimeşqê bigre êdî li Suriyê dibe hêza desthilatdar. Lê zanîbû ku bajarê Dimeşqê ji bo Dewleta Osmanî jî pir muhîm e, çûnkî Dimeşq mufteya Hîcaz û Misirê bû. Armanca Elî Paşayê Canpolatî îmhakirina hêza Yûsûfê Seyfo bû. Yûsûfê Seyfo xwe avêt kela hundur. Elî Canpolat ji bo ku Yûsûf Seyfo bidest bixe di 30 Îlona 1606 an da fermana talankirina bajarê Dimeşqê da leşkerên xwe. Talankirina bajêr bandorek mezin çêkir. Yûsûfê Seyfo ji bo reva xwe 100.000 zêr bertîl da qadiyê Dimeşqê. Qadî, ji bazirganên Dimeşqê 25.000 zêrê din girt û kir ser ê Yûsûfê Seyfo, da Elî Paşa yê Canpolatî ku pê razî bibe. Elî Paşa yê Canpolatî pere girt û ji bazirganê biyanî ra jî ji bo serbest ticaretê bike ferman da. Ev helwesta wî nîşan dikir ku wexta dewleta xwe pêk bîne wê bi bazirganê Ewrûpê ra hevkariyê rind bike.

Sê roj şûn da Elî Canpolat û Fexredînê Maan bi hêzên xwe dan ser şopa Yûsûfê Seyfo ku wî bigrin. Şopê ew birin ser **Hisnu'l Ekradê**. Yûsûfê Seyfo di hundurê kelê da asê mabû. Elî Canpolat, pêşniyariya aşitî xwestina Yûsûfê Seyfo şûnda venegerand û li hev rûniştin. Di serê li hev rûniştinê daYusufê Seyfo şertên Elî Canpolat pejirandin û ji bo peymanê xurt û mayinda bikin, jin dan hevûdu. Êdî Elî, Fexredîn û Yûsûf bûbûn xwediyê Suriyê giştîkî, lê hukumdariya Elî Paşayê Canpolatî ser herduyên din re bû.

Li ser van erd dagirkirinên Elî Paşayê Canpolatî, Osmanî ew ji walîtiya Helebê azl kir û biryara tenkîla wî da. Paytexta Osmanî bi vê armancê yekî bi navê Husên Paşa tayinî walîtiya Helebê kir û şand Helebê. Serdarê Osmanî Ferhad Paşa 1000 leşkerê bi tivink da emrê Husên Paşa û ser Edenê ra şand Helebê. Ferhad Paşa salix dabû Husên Paşa ku li ser riya xwe paşayê Edenê Cemşîd jî bikuje. Çunkî Cemşîd jî li hember Osmanî serî rakiribû. Cemşîd xeber hilanî ku Husên Paşa tê, kêmîn li ber danî û ew kuşt. Wexta Elî Paşayê Canpolat bihîst ku Cemşîd, Husên Paşa bi rêve kuştiye pir kêfxweş bû, baweriya wî zêda bû û li ser navê xwe pere derb kir. Cemşîd jî bi eslê xwe Kurd bû. Heta têgotin ku Elî Paşa yê Canpolatî li ser vê serketina Cemşîd, Edene jî li ser erdê dewleta xwe dihesiband û ew kir waliyê Edenê.

Dewleta Osmanî li hember Elî Canpolat bêçare mabû û bêdil mîrêmîraniya Helebê ji bo Elî Canpolat re erê kir. Elî Canpolat çar hîv berê di Gulana 1606 an da daxwaznameyek şandibû paytexta Osmanî. Ev daxwazname ya ji bo peymanek bê erêkirin di navbera paytexta Osmanî û Elî Paşayê Canpolatî da. Elî Paşa heger ji bo wî û merivên wî cûrbecûr postê maqaman bê dayin ewê ji bo sefera Îranê 16.000 leşker di

rêke. Gorayî Elî Paşa, Osmanî di tengasiyê da ye; li rojavayî împaratoryayê bi ewrûpayiyan re, li rojhilat bi safewiyan re û di hundur da jî bi Celaliyan re di şer da ye. Osmanî mecbûre ku van daxwazana qebûl bike. Îcar heger Osmanî van maqamana bide Elî Paşa û merivên wî rojhilatê împaratoryayê dê bikeve bin hukmê Elî Paşayê Canpolatî.

Daxwazên vê nameya Elî Paşayê Canpolatî di Îlona 1606an da hatine qebûl kirin û Elî Paşa bûye mîremîranê Helebê yê meşrû.

Êdî dost û hevgirtiyê Elî Canpolat li rojava ji Tersûsa Kilîkyayê ber bî Qeyseriyê, Yozgatê, li bakur hetanî Çemîşgezekê, li başûr dardora Reqayê, derbendên Çiyarêzên Torosê û rêyên ku diçûn Îranê ketîbûn bin hukumdariya wan. Ji terefê Elî Canpolat da kontrolkirina van herêman ji bo Osmanî xeterek gewre bû çunkî riya Îraqê, Hêcazê, Qudsê dihat girtin. Osmanî jî bi fenên siyasî dest navêt Elî Canpolat ku hetanî li Balkanan xwe piştrast bike û celaliyên Enedolê bertaraf bike.

**Hedefên Elî Canpolat:**

Danhistendinên Elî Canpolat bi celaliyên li Kurdistana Bakur û Bexdayê ve ji zûda hebû. Ji Celaliyên mezin Cemşîdê Edenê û Tavil Xelîlê Bozokê ra arîkariya aborî dikir. Bi Mahmûdê Tavilahmedê Bexdayê wek hevkarê konfedarasyonekê kar dikir. Elî Paşa difikirî ku Mahmûdê Tavilahmed têk biçe herêma Bexdayê ji bo wî cihekî dinê bidestxistinê bû.

Elî Canpolat bi celaliyên Anatolyayê Mehemedê Qalendaroxlî û Qere Seîd re jî têkilî danî bû.

Elî Canbolat bi mîremîranê Karamanê û Yusuf Paşayê mîremîranê Sarûhan û Aydinê û Mûslû Çawişê Sîlifkeyê re jî têkilî danî bû. Navbera wî mîrêmîranê Mereşê Delî Zulfîkar Paşa nerindbû, ji Osmanî daxwaz dikir ku wî biguherîne. Delî Zulfîkar Paşa jî bi eslê xwe Kurd bû. Leşkerên wî jî hemû Kurdên bermahiya mîrektiya Dûlqadiriyan bûn, gumanek mezin e ku ji Hoza Sinemilî bin.

Elî Canpolat rêvebirya dewleta xwe bi rêxistinî kir, dîplomasî û siyaseta derveyîn bi pêş ve xist. Artêşa xwe wek artêşa xurt kir. Efser û fermanderên wî maaşê têrûtije distendin. Griswold[21] dibêje ku li ser gotina elçiyê Frensayê sancaxa wî ji rengê spî bû. Topên wî hindik bûn. Top him biha bûn, him jî li erda Sûriyê pir ne hewce bûn. Yekî bi navê **Xertawî Axa** ku ji eşîra Bêzikî bû, anî ser hêza siwariyan. Heleb ji xwe ra kir paytext. Dîwana xwe ava kir. Yekî bi navê Abaza Mehmed jî kir xeznederê xwe. Pereyê Ewrûpayê û yên Osmanî jî li Helebê darbas dibû. Elî Canpolat pereyên xwe jî darb kirin û li ser navê xwe xutbe da xwendin.

Bi bazirganê ermenî û biyanî re têkiliyên erênî danî. Lê konsolêsên ewrûpayî bêbiryar mabûn. Destekdayina Elî Canpolat ji bo wan metirsiyek bû. Qralê Frensayê Henri yê IV. hêja nedidît ku bi Elî Canpolat re têkiliyê deyne û alîkariyê bideyê. Wenedîkiyan hewildanên Elî Canpolat ji nêzve dişopandin. Tenê Toskaniyan destek didan wî.

Di Berfanbara 1606 an da Sadrazam û Serderê Engurusê Quyûcû Mûrad Paşa bi Awûstûryayê re peymana aşitiyê ya Zîtwatorokê destnîşan kiribû û êdî ji hêla rojava da xayileyên şer û pevçûnê nemabû. Qûyûcû Mûrad Paşa bi ezbeta xwe ji xirwatên Bosnayê bû[22], dewşirme hatibûgirtin û di mekteba enderûnê da perwerde bûbû. Tevî gelek seferên Osmanîyan bûbû, li gelek parêzgeh û sencaxên Osmanî mîritî kiribû, 1594 an da mîrêmiranê Dimeşqê, 1595 an da yê Diyarbekirê bû.

Qûyûcû Mûrad Paşa bû sadrazam şûn da pêşikiyên Dewleta Osmanî ya Rojhilatê guherand. Qûyûcû Mûrad Paşa metirsiya dewlet damêzirandina Elî Paşayê Canpolat ji tecawuzên Safewiyan mezintir dît û şerê bi Îranê re taloq kir. Elî Paşayê Canpolatî kir

hedafa xwe ya yekemin. Dixwest ku hîn Elî Canpolat ji derve alîkarî wernegirtiye, wî ji holê rake. Ji bo sefera ser Elî Canpolat bêdang û bi dizî di nava şeş mehan da leşker û çek berhev kirin.

Elî Canpolat jî baca dewletê mûntazam dişand û daxuyanî didan ku bi dewletê ve girêdayîye

Ji Elî Canpolat re eşkere bû ku gerek hevkaran ji xwe re çêbike. Ji bo ku dewletên biyanî dewleta wî nas bikin gerek naqdî dahata wî pir ba û xezîneya wî tije ba. Naqdî dahat jî ancax bi bazirganiyê mumkun bû. Divêt ku dewletên biyanî dewleta wî nas bikin vê re bazirganiyê bikin. Wê hingê tê heşê mirov ku Elî Canpolat li hinek deriyê dewletên biyanî xistiye. Tu çavkaniyên Osmanî û Safewî qala ragîhandina Elî Canpolat û Safewiyan nake, lê dîplomat qala ragîhandinê dikin.

Kerîm[23] dinîvîsîne ku: "*Ji bo artêşa xwe bêyî Kurdan ji Tirkman û Ereban jî leşker berhev kirin. Di sîstema dewlet û artêşê da Dewleta Osmanî teqlîd kir.*

*Elî Canpolat ev dewleta ji bo şan û şerefê ne, ji bo xelkê herêma xwe di ewlekariyê da bijî ava kiribû. Ji xwe herêma Canpolatan di Dema Eyûbiyan da jî xwediyê otonomiyê bûn."*

Ji Elî Canpolat re peşniyariya alîkariyê ji Ewrûpayê hat. Dukê Tosqanyayê Ferdînandê I. pir dixwest ku Girava Qibrisê û erdên pîroz zeft bike û kontrol bike. Ferdînand bi vê mebestê dixwest bi Helebê re bazîrganiyê geş bike. Ji bo bazirganiyê pêdivî bi bêndara Îskendarûnê hebû. Ferdînand zadaganekî Tosqaniyayî bi navê **Hippolito Leoncini** şande Helebê. Leoncini wexta hat Helebê, Michel Angiolo Corai jê re rehberî û tercumanî kir. Corai, xrîstiyanekî ji Helebê bû û berê jî rehberiya Ewrûpayî û Îraniya kiribû. Elçiyê Dukê Floransayê peymanek ji sî maddeyî pêkhatî pêşkêşî Elî Canpolat kir. Gorayê peymanê Qudsê ji xaçperestan re vebe, mesîhiyên bê bac werin tewafa Qudsê. Ji Elî Canpolat re 1000 tiving û penc topên bê dayin. Bazirganiya li bêndaran wê serbest be. Gorayê Griswold[24] di vê peymanê da li Elî Paşa niheqî hatiye û ew bûye xizmetkarê Ewrûpayiyan. Rast jî herhal Elî Canpolat sirf ji bo bi Ewrûpayiyan re têkiliyê deyne ev peymana navnîşan kiriye û di vî karî da jî pir xeşîm û nezan bûye.

Gorayê dîtina min ev peymana bi taybetî bûye sebeba têkçûyina Elî Paşa. Çunkî ji Osmanî re riya meşrûyetê vedike ku biçe ser Elî Paşayê Canpolatî.

Elî Canpolatî bîr nedibir ku li ser vê peymanê Venedîk, Fransa, Îngîltere û hêzên dinên Ewrûpayê dê çi bikin. Eşkereye ku korsanên Floransayê malen talana bi riya Helebê li herêmê bifroşin ji vîna Osmanî û ew dewletên Ewrûpayê zirarê bibînin, loma ewên li dijî vê peymanê tedbîran bigrin. Dewleta Osmaniyan dê bavêje ser Dewleta Canpolatan û ew dewletên Ewrûpayê jî alîkariyê bikin.

**Helwesta Osmanî û Şerê Deşta Rûcê:**

Qûyûcû Mûrad Paşa ji bo Dewleta Elî Paşayê Canbolatî birûxîne stratejîyek nuh ava kir. Wî hetanî nuha ji penc Siltanê Osmanî re xizmet kribû. Hîlebaz û fetbaz bû. Zanîbû ku salekê dareng bixe, êdî Dewleta Canpolatan wê xûrt bibe û tu hêz nekaribe wê birûxîne. Pêşî zivistan bû, lê keşûhewaya Kilîkya û Berrîyê nerm bû. Hetanî ku ewê biçe ser Elî Canpolat, pevnivîsên resmî da tu cara navê Elî Canpolat, derheqê serhildana wî da tu nivîs tunene. Tê heşê mirov ku aya ji veşartina seferê, yan jî vê dawiyê ji bo Dewlet avakirina Elî Canpolat eşkere nebe loma wek tedbir hatine îma kirin. Çunkî Elî Canpolat Kurd bû û bi hêzên Kurda bi giranî herêmeke niştecîhên wê Kurd lê Dewlet ava dikir.

Qûyûcû Mûrad Paşa axirê di 10ê Tîrmeha 1607an de ji paytexta Osmanî bi rêket. Hetanî gihîşt Konyayê Celaliyên qels ji bo bexşandinê xwe avêtin ber lingê wî. Qûyûcû Mûrad ji bo ku navê wî belavbibe, çendik celalî efû kirin, lê gorayê xwe yên ku iflah nabin îdam kir. Ji xwe di artêşa wî da gelek celaliyên berê hatine efûkirin jî hebûn. Qûyûcû Mûrad ji sedî zêdatir leşkerên Delî Ahmedê mîrêmîranê Qaramanê kuşt ku ew bi alîgiriya Elî Canpolatî dihatin tawanbar kirin.

Qûyûcû Mûrad Paşa gihîşt Konyayê şûn da hedafa xwe eşkere kir ku diçe ser Elî Paşa yê Canpolatî. Sedema nependitîyê û ecelekirina xwe vegot[25]: "*Ev sefera ne ji bona erdê ku ketine destê Şahê Îranê ye, ji bo Elî Paşayê Canpolatî û hevalbendê wîne*."

Qûyûcû Mûrad Paşa berêberê îsyankarê bi navê Kalendaroxlî ji bo ku ji paş ve li wî nexe payeya mîremîrantiya Enkereyê dayê, lêbelê alayêk hêza xwe ji bo konrol û şopandina wî li wê derê hişt. Wexta artêşa wî di derbendên çiyarêzên Torosê re derbasî Kilîkyayê bû hevalbendê Elî Canpolat, Cemşît Beg bi fenûfûtên taktîkên leşkeri ji holê rakir. Hêzên Cemşîd li ber artêşa Osmanî belavela bû. Artêşa Osmanî ji derbendên Torosê derbasî Kilîkyayê û Edanê bû. Qaşo Elî Canpolat pere şandibû ji Cemşîd re, ew jî ketibû destê Qûyûcû Mûrad. Qûyûcû Mûrad li Edenê bêhna xwe veda, gelek îsyankarên merivên Cemşîd îdam kirin, kêmaniyên xwe jî temam kirin.

Di wê navberê da destûra tayinkirina mîrektiya panzdeh sancaxan jî hîn nuh gihîştibû ber deste Elî Canpolat, lê wî fersend nedîbû ku merivên xwe tayin bike. Qaşo apê xwe Mîr Heyder kiribû mîrêmîranê Mereşê, lê nekarîbû biçe li meqamê xwe rûne, çunkî Delî Zulfîkar Paşa waliyê wê dere bû û bi hêza xwe berbî qada şer dihat.

Hêviya Elî Canpolat ji îsyankarê Bexdayê Tavil Ahmed hebû, lê ew jî ji terefê fermanderê Osmanî Nasûh Paşa ve hatibû kuştin. Dujminê wî yê xwînî Mahmûdê Sînan Paşayê Çîgalazade jî bûbû mîrêmîranê Dimeşqê. Gorayê peymana bi Toskanyayê re ji Toskanyayê hîna çek nehatibûn. Xebera wî ji Kalendaroxlî jî tune bû ku Qûyûcû Mûrad Paşa ew kiriye mîremîranê Enkerê. Qaşo bi zanebûn li Misîsê peşya artêşa Osmanî negirt ku bira ji paş ve Kalendaroxlî êriş bike.

Qûyûcû Mûrad Paşa di artêşa Osmanî da hemû hêzên Rûmeliyê û Enedolê civandibûn serhev û ji Edenê bi rê ket. Griswold[26] pir xweş vedibêje û ji xwe zatî nîvêpir jî ji berhema Katibê Topçûyan Evdilqadir[27] wergirtiye, vê sefere da rojane çi qewimiye vedibêje.

Artêşa Osmanî ji hêla hejmarî da du qatî li ya Elî Canpolat bû. Pencî topên herî mezin hebû. Fermanderê hêza topa Tîryakî Hesen Paşa bû ku salek berê li ber Kela Qanîjeyê serketinek mezin nîşan dabû. Di artêşa Osmanî da bi hezaran leşkerê tivingçî hebûn. Tiryakî Hesen Paşa li derbasoka Belenê(Bakras) da topên xwe li herdu aliyên geliyê darbasokê da veşart, bi hîlebazî hêzên Kurdan kişandin derbasokê. Wexta top teqiyan ji siwariyên Elî Canpolat re derbasok bû wek dojehê. Dûmana barûta reş girte ser derbasokê. Hêzên Elî Canpolat belav bûn û têk çû. Dawiya şer li Daşta Rûcê(navê nuka Oruç Ovası ye) hetanî Çemê Efrînê dawam kir, lê êdî hêzên Elî Canpolat nekaribûn xwe li ber artêşa Osmanî ragrin û li ber xwe bidin. Griswold[28] Elî Canpolat bargeha xwe li rexê Gola Emkê saz kiribû.

Mumkune ku berî şerê dawîn Elî Canpolat ji bo aşitiyê carek din hewl dabe ku bi Qûyûcû Mûrad Paşa ra hevdîtinê bike û red bûbe.

Û dî dawîyê da roja 23 Çiriya Pêşî ya sala 1607an Şerê Deşta Rûcê bî pey lîhevdanên dîjwar şûn da bi dawî bû, artêşa Canpolatan têk çûbû.

Koçu ji waqanîvîs Naima Efendî wiha veduguheze[29]: "Hetanî roj çû ava 26.000 serê celaliyên ku hatibûn kuştin li ber konê serdar mîna çiyayekî kom bû. Bîst celadan bêsekin serê celaliyên dîlgirtî jêdikirin. Cendek yek bi yek ne mumkun bû bê gor kirin, hema çalên kur vedibûn û cendek dixistinê".

Di pey têkçûyinê re Elî Canbolat jî bi rojhilat da reviya û berê xwe da Kilîsê. Malbata xwe berhev kir, xizna xwe girt û çû Helebê. Zavûzêçên xwe, nêzîka sed leşkerên xwe yê pê bawerî dianî ve li kela hundur Helebê cih dayê. Têkçûyin tê hil nedihat, ji kerba nezanîbû çer bike, tertilî bû jî. Lê dixwest li berxwe bide. Ji bo hêza xwe xurtkirinê bi 2000 siwarê xwe ve berî da Berriya binahiya Ruha û Mêrdînê navenda eşîrên Milan. Wexta ber bî vê herêmê hat hêviya wî ji eşîrên Milan ên vê deverê û ji Bexdayê Tavil Ahmed hebû. Herhal Milan bi xwe da ketibûn nekarîbûne û çavên wan nebirrî bû ku alîkarî bidin. Ji Bexdayê jî tu hêzên alîkariyê nehatin. Elî Paşayê Canpolatî xwest têkeve xizmeta şahê Safewiyan, herhal ji şah re name şandiye ku bersîv heye. Griswold[30] ji Naima veduguheze û dinivîsîne ku: Eger şah qebûl bikira ji xwe derfet nedibû ku car jî vegere ser welat û meqamê xwe, pir-pir canê xwe xelaskira. Lê li ser bersîva Şah Ebas, Elî Canpolat şaşmayî dimîne. Çunkî Şah Ebas di bersîvê da dibêje ku: pêdivîya Elî Canpolat bi leşkera nîne, eskerê wî ji xwe zahf e.

**Komkujî û mişextîkirina Kurdên Rojava:**

Qûyûcû Mûrad Paşa êdî bi kêfa xwe hate Kilîsê û dest danî ser xizneya mayî, mal û milkê Canpolatan. Merivên pêbawer tayinî mewkiyên îdara deverê kir. Di 8 Sermaweza 1607an da gihîşt ber Helebê. Bajar vê re teslîm bû. Li wê derê jî gelek însanên alîgirê Elî Canpolat hatin îdam kirin. Lê Kela hundur bi rehetî nehat zeft kirin. Qûyûcû Mûrad Paşa fahm kir ku ancax bi fenûfûta dikare zeft bike. Paşa xeber şand ji jinên Canpolatan re û soz da ku heger ew deriyê kela hundur vekin, mafê serbest çûyina wan dê hebe. Wexta yên hundur derî vekirin û derketin der, leşker û jin ji hev veqetandin. Belkî çend kes efû kiribin lê yên mayî hemû îdam kirin.

Bi nivîsandina Koçu, Tiryakî Hesen Paşa tahamulî van bêbextî û kiryarên Qûyûcû Mûrad Paşa nekir, kalbûna xwe kir bihanê teqawîta xwe xwest û ji artêşê qetya çû Stenbolê.

Qûyûcû Mûrad ji bo bihara 1608an da bi pey Elî Paşayê Canpolatî ke ve, zivistan li Helebê bihurand. Yêngîçerî li cem xwe girtin, artêş û fermanderên Anatolyayê û Rûmeliyê serbest berdan. Dibe ku Elî Canpolat hêz berhevkiribe û bi ser da were, loma haziriya xwe kir. Heleb bajarekî Berriyê ye, germiyan e, keşûhewa zivistanê nerm e. Xwarin û vexwarin zahf e, loma leşker jî aciz nebû.

Koçû ji weqanivîsa wiha veduguheze[31]: "Şeş hîva bi kêf û sefa li Helebê zivistan bihurand. Her roj sed, dused celalî digirtin dianîn û serê wan jêdikirin." Di şeş mehan da herhal nêzîka 20-30 hezar meriv kuştine.

Gorayê dîtinên min Qûyûcû Mûrad Paşa ji reîs û şêxên ereban ji bo sefera ser Îranê û Celaliyên mayî alîkariya leşkerî xwestiye. Bêyî wan bang Yûsûfê Seyfo û Şêx Fexredînê Maan jî kiriye. Herdu ji derketine huzûra Qûyûcû Mûrad Paşa. Herduya jî uzrên ku Mûrad Paşa bi pejirîne pêşniyar kirine. Mûrad Paşa xiftan li wan kiriye, diyarî daye wan û gotiye biharî bi leşkerên xwe amade bin.

Elî Paşa yê Canpolat berê xwe da paytexta Osmanî û mamê xwe Mîr Heydar Beg û Ketxudayê xwe Husên Axa pêş da şand ba Siltan. Elî Paşa li nêzîkê Bûrsayê li Gundê Pazarcikê li biryargeha Qelendaroxlû rast hat. Di 28ê Berfanbara 1607an da bi peşdirên

celaliyan re hinek hevdîtin pêk anî. Dihevdîtinan da nexistin serê hev. Gorayê Koçû, Qelendaroxlû bihîstiye ku Elî Paşayê Canpolatî diçe paytextê, ji bo efûyê biçe ber Siltanê Osmanî. Wexta Elî Paşa tê hinda Qelendaroxlû. Qelendaroxlû dev diguhere, dibêje ji min meqete, ezê heyfa te hilînim. Elî Paşa û merivên wî ji hev diqetîne, Elî Paşa û birazyê wî di xanîyekî da dîl digre. Elî Paşa vê mûamele û nêta wî fahm dike, bi şev xênî qul dike û tevî birazyê xwe firar dike. Di nav daristanê re bi zor rê derdixe û xwe digihîjîne Mûdanyayê. Li Mûdanyayê li Kahyayê xwe rast tê.

Siltanê Osmanî Ahmedê I. xebera hatina Elî Canpolat hilanîbû û hatina wî rindtir didît. Gorayê Siltan Ahmed, çunkî hatina Elî Canpolat dê bandorek erênî li ser celaliyên din jî bikira. Siltan Ahmed şandeyek şand ku Heydar ji qiraxa Anatolyayê bînin Serayê û Bostancîbaşî jî vezîfedar kir ku li qiraxa Anatolyayê li hêviya Elî Canpolat be. Bostancîbaşî û Elî Canpolat di rê de li hev qelibîn. Tev li keştiya qaptan sîwar bûn.

Siltan Ahmedê I. bi hatina Elî Canpolat re li qesra xwe dîwan civand. Di dîwanê da Şêxulîslam ji bo îdamê fikrê xwe nîşan da, lê yên din gorayê meyla Siltan efû pêşniyar kirin. Siltan bê biryar ji dîwanê derket. Giswold[32] ji gotinên yekî Wenedîkî veduguheze ku bi çavên xwe dîtiye: Bi merasîmek topavêtinê pêşwazî li Elî Canpolat hat kirin wexta li ber qesra Siltan ji keştiyê peya bû, di bin banga qelebalixê da ew girtin qesrê. Elî Canpolat anîne huzura Siltan Ahmed. Elî Canpolat li ber Siltan xwe bera ser çongê xwe da, xûz bû bû û paşê lingê Siltan Ahmet ramîsa û bexşandina xwe xwest.

Siltan Ahmed, Elî Canpolat hefteyekî da ber lêpirsînê. Gorayê Griswold[33] Elî Canpolat rola xwe rind lîstiye ku padîşah ew rind hemilandiye, xiftan lêkiriye, xilat danê û di qesra sadrazamê kevn da cîh dayê. Elî Canpolat herdu xortên bi xwe re anîbûn ku nayê zanîn zaroyê wî bûn, an birazyê wî bûn ew dan mekteba enderûnê. Yek ji wan bi navê **Mistefayê Canpolat**[34] bi qîza Padîşah Ayşe Siltanê re zewiciye, berê bûye mîrêmîranê Rûmeliyê, paşê jî di salên 1631-1632an da bûye Kaptan-î Darya.

Herçuqas rêvebir û bijarte kesên paytexta Osmanî dixwestin ku Elî Paşayê Canpolatî bê îdam kirin jî Padîşah ew li Rûmeliyê li Temeşwarê kir mîrêmîran. Temeşwar cihê surgunkirinê bû. Çar sal berê jî birayê Evdilhelîmê Qere Yazicî, Delî Hesen bi zanebûn û fenên Dewleta Osmanî bûbû mîrêmîranê Temeşwarê. Yêngîçeriya tahm nedabûnê, ew jî revya bû Belgradê. Dawiya dawiyê Tiryakî Hesen Paşa ew û birazyê wî li Belgradê kuştun û laşê wan avêt Çemê Dûnayê. Yêngîçeriyan li Elî Canpolat jî wisa kirin. Elî Canpolat jî ji ber yêngîçeriyan reviya Belgradê. Wexta Qûyûcû Mûrad Paşa gihîşt paytextê agahî girt ku Elî Canpolat hatiye paytextê û Siltan ew efû kiriye, ser da tayinê mîrêmîraniya Temeşwarê kiriye. Paşa ferman şand Belgradê û ew da xeniqandin. Gorayê elçiyê Fransayê ew roja 1ê Edara 1610an da mir[52]. Projeya dewlet Demêzirandina wî jî têk çû. Eger projeya wî bi ser keta, dewleta wî yê ava biba û aniha ew dewletayê çarsed salî bû û paytexta wî Heleb bû.

Barkey[35] wiha dinîvîsîne: “Eşkere bû ku Celaliyan ji bo devlet avakirinê serî hilnedabû. Tenê Elî Paşayê Canpolatzada yê Sûriya Bakur li ber Dewlet avakirinê da bû.”

Gelek eşîrê Kurd ji zalimî û xedariya Qûyûcû Mûrad Paşa coxrafiya guherîn, hinek çûn Enedolê, hinek çûn Berriya Rojhilat devera Ruha û Mêrdînê. Hinek çûn Kurdistana Rojhilat û Îranê. Li Kurdistana Rojhilat li herêma Zencan û Xalxalî bi navê Kilîsxanî û Canpolatî du eşîrê Kurd hene. Romannivîsê Kurd Ereb Şemo di romana xweya bi navê Şivanê Kurmanca da qala Daşta Kilîsê dike ku li devera Xelatê ye. Kurdên Kilîsê wê demê çûne wir û ew nava jî bi xwe ra birine wê derê. Hinek çûn Enqere û Konyayê, Cîhanbeylî

û Yûnakê. Yên bûbûn qizilbaş jî çûn Meletyê, Elezîzê û Dersimê. Hinek surgunî Girît, Qibrisê û Bêrûtê bûn. Yanê damografya Kurdistana Rojava hat guherîn.

Qûyûcû Mûrad, eşîrên Erebên binê Berriyê jî paye dayê û bi dewletê ve girêda. Ji vê şûn da ku baca xwe bidin dewletê dê serbest bin.

Qûyûcû Murad Paşa ji dokumanên li Helebê bi destketî da fahm kir ku hevpeymanek di navbera Elî Canpolat û Dukê Toskanyayê da heye, ji vê peymanê bazirganên Îranê û Dukayetiya Toskanyayê sûd verdigre, loma ferman da ku Bêndera Îskendarûnê bê girtin. Ji girtina Bêndera Îskendarûnê bazirganên Helebê jî pir aciz bûn. Loma Trablûsşamê dewsa Îskendarûnê girt ku ji viya Yûsûfê Seyfo kar kir.

Şêx Fexredînê Maan di pey bexşandinê re bi dukê Toskaniyayê re têkilî danî. Projeya dewlet avakirina Elî Canpolat anuka wî dabû ber xwe. Mediciyan jî dixwest ku projeya xwe ya Qibrisê û hevkariya Sûriyê bimeşîne. Ew 1000 tiving û 5 topên ji Elî Canpolat ra hatibû ameda kirin hîn di destê wan da bû. Şêx Fexredîn, di encama dan û sitendinan da hevpeymanek wekî ya Elî Canpolat navnîşan kir. Xêra bazirganiyê bendara Bêrûtê pir mezin û geş bû.

Bermahîya malbata Canpolatan çûn Lubnanê xwe spartin Şêx Fexredînê Maan ku ji xwe xismên hev bûn. Li wir baweriya olî guherîn û bûn durzî. Di pêvajoyê da bûn rêvebirê Durziyan ku hetanî nuka jî bandora wan dûm dike.

**ÇAVKANÎ:**


Acıpınar, M. I. FERDİNANDO’NUN DOĞU AKDENİZ POLİTİKASI VE TOSKANA DONANMASI’NIN 1607 MAGOSA SALDIRISI. Tarih İncelemeleri Dergisi, XXX / 2, 2015, 357-384

Afyoncu, E. (2006). Sokuluzade Hasan Paşa. İslam Ansiklopedisi, Cîlda 37, r.: 366-368.

Akdağ, M. Celali İsyanları (1550-1603). ANKARA, ÜNİVERSİTESİ DİL ve TARİH-COĞRAFYA FAKÜLTESİ YAYINLARI, Ankara.

Akis, M. Tahrir Defterlerine Göre 16. Yüzyılda Kilis Sancağındaki Aşiretlerin İdareleri, Nüfusları ve Yaşam Tarzları. Ankara Üniversitesi Açık Erişim Sistemi. http://dergiler.ankara.edu.tr/dergiler/18/32/232.

Akis, M. İ. Hakkı Konyalı Armağanına Katkı: Kilis Sancağında Canbolat Oğulları Ailesinin Yönetimi. ŞEHİRLERİN SEVDALISI İBRAHİM HAKKI KONYALI ARMAĞANI, 2015, Konya. r.: 391-404.

Altan, E. (2018). Antakya Haçlı Prinkepsliği Kuruluş Devri (1098 – 1112). Türk Tarih Kurumu. Ankara.

Andreasyan, D. H. Bir Ermeni Kaynağına Göre Celali İsyanları (Kemahlı Rahip Gregor). İstanbul Üni. Tarih Dergisi, Cilt 13, Sayı 17-18 (1963).

Aydoğmuşoğlu, C. İskender Bey Münşî’ye Göre Safevî Hükümdarı Şah I. Abbas’ın Revan (Erivan) Seferi (1603/1604). OTAM, 40 /Güz, 2016, 63-70.

Barkey, K. (2011). Eşkiyalar ve Davlet, Osmanlı Tarzı Davlet Merkezileşmesi. Tarih Vakfı Yurt Yayınları. İstanbul.

Barkey, K. Bandits and Bureaucrats. Cornell University Press. Ithaka and London. 1994.

Bozanî, Xêrî. Mîr Ceiferê Dasinî, 2011. https://www.wikiwand.com.

Ciwan, M. (2015). Çaldıran Savaşı’nda Osmanlılar, Safeviler ve Kürtler. İlk Kürt-Osmanlı İttifakı (1514). Weşanên Avesta, İstanbul.

Çakar, E. (2003a). 16. Yüzyılda Haleb Sancağı, 1516-1566. Fırat Üniversitesi Orta Doğu Araştırmaları Merkezi Yayınları. Elâzığ.
Çakar, E. (2003b). XVI. Yüzyılda Şam Beylerbeyliğinin İdari Taksimatı. Fırat Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi Fırat University Journal of Social Science Cilt: 13, Sayı: 1, Sayfa: 351-374, ELAZIĞ-2003.
Çakar, E. 2006. 17. Yüzyılda Haleb Eyaleti ve Türkmenleri. Fırat Üniversitesi Orta Doğu Araştırmaları Merkezi Yayınları No:13, Tarih Şubesi Yayınları. Elâzığ.
Çakar, E. 313 Numaralı Timar Ruznamçe Dafteri Ve Bu Dafterda Haleb Vilayeti İle İlgili Bazı Tespitler, Fırat Üniversitesi Sosyal Bilimler Dargisi, XI/1 (Elazığ, 2001), r. 235-246.
Çelik, Göknur. VÂSITÎ'NİN "GAZÂVÂT-I MURAD PAŞA" ADLI ESERİNİN İNCELENMESİ. Têza lisansa bilind(nehatiye weşan), 2006, İstanbul.
Çelik, Şenol. XVI. Yüzyılda Hanedan Kurucu bir Osmanlı Sancak Beyi: CANBULAD BEY. Türk Kültürü İncelemeleri Dargisi, sal 2002, hjmr.: 7, rpl: 1-34, TİSAV/ İstanbul.
Demir, Vecdi, Kürt Hanedanı CANBULATLAR Devlet Peşinde, Kürt Tarihi Dergisi, Sayı: 3, Sayfa: 32-39. İstanbul.
Demirkent, I. (1974). Urfa Haçlı Kontluğu Tarihi (1098 – 1118). İstanbul Üniversitesi Edebiyat Fakültesi Yayınları. İstanbul.
Demirkent, I. (1994). Urfa Haçlı Kontluğu Tarihi (1118 – 1146). Türk Tarih Kurumu Basımevi. Ankara.
Elî M. E. Çiyayê Kurmênc (Efrîn) Êzdî û Êzdiyetî. EFRÎN, 2008
DUMAN, Olcay ÖZKAYA. BİR ORTADOĞU BUHRANI CEBEL-İ LÜBNAN OLAYLARI (1860-61). http://sbed.mku.edu.tr/article/view/1038000566
Emecen, M. Feridun, 2000. Yavuz Sultan Selim. Yitik Hazine Yayınları. İzmir.
Erdoğan, Meryem Kaçan. KARAYAZICI İSYANI. Osmangazi Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi Cilt: 4 Sayı: 2 Aralık 2003.
Griswold, J.W., 2011. Anadolu'da Büyük İsyan. Kırmızı Yayınları, İstanbul.
Griswold,W. J. The Great Anatolian Rebellion (1000 -1020 / 1591-1611). KLAUS SCHWARZ VERLAG BERLIN 1983.
Gümüş, Ercan. 16. Yüzyılda Osmanlı Davleti'nda Meydana Gelen Muhalif Nitelikli Hareketlerin Osmanlı Tarih Yazarları ve Eserlerine Yansımas. (Têza Mastirê-2008, nehatî weşan). Gazi Üniversitesi. Ankara.
Hammer, Joseph von. 1917. Osmanlı Tarihi, Cilda 8a. Istanbul Millî Eitim Basimevi
Kerim, A. H, 2011. Balkan Yarımadasında Kürtler. Evrensel Basın Yayın. İstanbul.
Koçu, E. R. 2001. Dağ Padişahları. Doğan Kitapevi. İstanbul.
KİLİSLİ Kadri, (1932). Kilis Tarihi, İstanbul.
Konyalı, İ. H. (1968). Abideleri ve Kitabeleri ile Kilis Tarihi, İstanbul:
Fatih Matbaası.
Lescot, R. 2001. Yezidiler. Avesta Yayınları. İstanbul.
Öztuna, Y. (1989). Devletler ve Hanedanlar Türkiye (1074-1990). Cild 2. Kültür Bakanlığı Yayınları. Ankara
Öztürk, M. (2004). 16. Yüzyilda Kilîs, Urfa, Adiyaman ve Çevresinda Cemaatler-Oymaklar. Fırat. Üni. Orta-Doğu Araştırmaları Merkezi Yayınları, No:7. Elazığ.
Öztürk, M. 2005. İzziye Kazasının Kuruluşu ve Milli Mücadaledaki Yeri, Ankara Üniversitesi Dil ve Tarih-Coğrafya Fakültesi Tarih Araştırmaları Dargisi, S. 37 (Prof. Dr. Yücel Özkaya'ya Armağan).

Peçevî İbrahim Efendi, Peçevî Tarihi, cilt I., Ankara 1999.
Rafeq, A. The Revolt of Ali Pasha Janbulad(1605-1607) In the Contemporary Arabic Sources and its Sihnificanse. VIII. Türk Tarih Kongresi, 11-15 Ekim 1976, Ankara (III. Cilt).
Rasim, A. 2000. Osmanlı Tarihi. Cîld. 1. Hikmet Neşriyat, İstanbul.
Reşo, X. C. Mîrgeha Şêxan, Şingal û Kilîs. Kürt Tarihi, Sayı: 15, Sayfa: 34-45. İstanbul.
Sallabî, M. A. (2014). Zengiler Dönemi İslami İdarenin Yeniden Hâkim Kılınması. Ravza Yayınları. İstanbul.
Selim, H.H. (1974). La Famille Des Djoumblatt Du VIIe. Siécle A Nos Jours. Beyrouth, Liban.
Soyudoğan, M. Aşiretlerin Ekonomi Politiği Ya Da Olağan Şiddet: Osmanlı Ayıntab'ında Aşiret Eşkıyalığı Üzerine. Kebikeç, Sayı:21, Yıl: 2006, s.147-174.
Şerefxanê Bidlîsî, Şerefname(1597), Werger: Ziya Avcı, Weşanên Avesta, 2007. İstanbul.
Topçular Kâtibi Abdulkadir (Kadri) Efendi Tarihi, 2003. Cild I-II. Türk Tarih Kurumu, Ankara.
Varlî, E. M. M. (hoko) Xanî. 1997. Dîroka Dugelên Kurdan (600-1500). Weşanên Sîpan, İstanbul.
Yılmaz, S. 2006. Mu'tazıd ve Müktefi Döneminde Abbasiler (279-295/892-908).
Kayıhan Yayınları, İstanbul.

**Perawiz**

---

1 Xêrî Bozanî, Mîr Ceîferê Dasînî.
2 Yılmaz, Abbasiler, r. 164.
3 Sallabî, Zengîler Dönemi, r. 105-107.
4 James, Selahaddin ve Kürtler, r. 28-44.
6 Reşo, Mîrgeha Şêxan, Şingal û Kilîs.
7 Reşo, Mîrgeha Şêxan û Şengal û Kilîs(bi vî sernavî di gelek malperên internetêde heye.
8 Emecen (2012), Yavuz Sultan Selim, r. 231.
9 Çelik, XVI. Yüzyılda Hanedan Kurucu bir Osmanlı Sancak Beyi: CANBULAD BEY. r. 33.
10 Şerefname, r.: 322
11 Şerefxan, Şerefname, r. 320
12 Griswold (2011), Anadolu'da Büyük İsyan. r.: 111
13 Griswold (2011), ji Şidyak veduguheze: Anadolu'da Büyük İsyan, r. 119
14 Koçu, Dağ Padişahları, r.58.
15 Griswold, Anadolu'da Büyük İsyan, r.:131.
16 Koçu, Dağ Padişahları, r.: 59.
17 Koçu, Dağ Padişahları, r.: 59.
18 Hammer, Osmanlı Tarihi, cîld 8, r. 70.
19 Griswold, Anadolu'da Büyük İsyan, r. 131.
20 Griswold, Anadolu'da Büyük İsyan, r. 131-132.
21 Griswold, Anadolu'da Büyük İsyan, r. 147.
22 Gorayê Griswold Qûyûcû Mûrad Paşa bi ezbeta xwe sirbî bûye. Griswold, Anadolu'da Büyük İsyan, r. 156.
23 Kerim (2011), Balkan Yarımadasında Kürtler, 307.
24 Griswold, Anadolu'da Büyük İsyan, r. 155.
25 Griswold, Anadolu'da Büyük İsyan, r.161.
26 Griswold, Anadolu'da Büyük İsyan.
27 Topçular Kâtibi Abdülkadir (Kadri) Efendi Tarihi 2. Cilt.

[28] Griswold, Anadolu'da Büyük İsyan.
[29] Koçu, Dağın Padişahları, r. 62.
[30] Griswold, Anadolu'da Büyük İsyan, r. 173.
[31] Koçu, Dağ Padişahları, r. 65.
[32] Griswold, Anadolu'da Büyük İsyan, r. 178.
[33] Griswold, Anadolu'da Büyük İsyan, r. 181.
[34] Di Rûz-nameya Sefera Rewan û Tebrêzê ya Siltan Mûradê IV. da navê Mistefayê kurê Canpolat derbas dibe. Çaxa Mîremîranê Rûmeliyê bûye, tevî vê seferê, li ser riya vegerê Siltan Mûrad ew ji mîrêmirantiyê azil kiriye. (Zeyrek, Ali. IV. Sultan Murad'ın Revan ve Tebriz Seferi Rûz-namesi. T.C. Kültür Bakanlığı Yayınları. Ankara.)
[35] Barkey, Eşkiyalar ve Davlet, r.: 192.

## CANPOLAT HANEDANI VE DEVLET KURMA DENEYİ


**Özet:**

ELİ PAŞAYE CANPOLATZADEİkürtler, Orta Doğu'da Araplar, Farslar ve Türklerden sonra en büyük etnik gruptur. EyyubiDevleti'nden sonra Kürtlerin yeni bir devlet kuramadığı bilinmektedir. Bazı Kürt hanedanlarının, Kürdistan'ın çeşitli bölgelerinde aşiret yönetimi yoluyla varlığını sürdürdüğü biliniyor. Bu hanedanların önemli bir kısmı Çaldıran Savaşı'ndan (1514) sonra Osmanlı Devleti'nin egemenliği altında yurtluk-ocaklık statüsüyle yönetimlerini sürdürmüşlerdir. Bu hanedanlardan biri de Canpolat Hanedanı idi. Merkezleri Kilis şehri idi. Bu hanedanın son üyesi Ali Paşa (1605-1607) Halep Beylerbeyliğini zorla ele geçirdi. Hata Şam'ı da egemenliğine aldı. Lübnan Şeyhleri ve Dürzilerle ittifak kurdu. Osmanlı, Ali Paşa'nın bu Defacto beylerbeyliğini engelleyemedi. Bağımsız bir devlet kurmak isteyen Ali Paşa, o dönemdeki bazı Avrupa devletleriyle diplomatik ilişkiler kurarak onlardan ateşli silahları temin etmek istedi. Avrupalılar için Halep önemli bir ticaret merkeziydi.

Osmanlılar, Ali Paşa'nın niyetini anladı. O dönemde Osmanlı Devleti'nin vezir-i azamı Kuyucu Murad Paşa idi. Kuyucu Murad Paşa, Avrupalılar ve Safeviler ile savaşı durdurdu ve Ali Paşa'nın devlet kurma çabalarını bertaraf etmek için tedbirler almaya başladı. Kuyucu Murad Paşa Osmanlı ordusunu sefere hazırladı ve yola çıktı. Toros Dağları'na kadar gideceği yeri belli etmedi. Safevilerin üzerine gittiği sanılıyordu. Toros Dağları'nı geçtikten sonra Canpolatların bölgesine yöneldi. Tarsus ve Adana'yı fethetti, ardından İskenderun'a yakın Amanos Dağlarında dar bir vadide Ali Canpolat'ın ordusu ile savaşa tutuştu. Canpolat'ın ordusu sakbân süvarilerden oluşuyordu. Osmanlı ordusunda ateşli silahlar ve cehennem topları vardı. Dar vadide topların patlamasıyla atlar ürktü. Ali Paşa'nın ordusu bozguna uğradı.

Kuyucu Murad Paşa, Canpolat'ın ordusunun yendikten sonra Afrin, Cum Ovası, Kilis ve Halep'te büyük katliamlar yaptı.

Ordusu bozguna uğrayan Ali Paşa Milan aşiretlerinden kendisine yeni bir ordu hazırlamak için Berriye 'ye (Urfa, Haran, Viranşehir ve Ceylanpınar) gitti. Nedeninin tam

olarak bilmiyoruz ama orada fikrini değiştirip Asitan'a (İstanbul) gitti. Ali Paşa, Kuyucu Murad Paşa’nın İstanbul’a dönüşünden önce Osmanlı Padişahı I. Ahmed'in (1604-1617) huzuruna çıktı. Sultan Ahmed onu affetti ve onu bugünkü Romanya’nın Temeşvar şehrine vali olarak atadı. Şehir ahalisi ve yeniçeriler bunu kabul etmediler. Ali Paşa Canpolat yeniçerilerin zorbalığı yüzünden Belgrad'a kaçtı. Ali Canpolat 1611'de Vezir Kuyucu Murad Paşa'nın emriyle burada idam edildi.

***Anahtar Kelimeler***: *Canpolatoğulları, Ali Paşa Canpolat, Kuyucu Murat Paşa, Kilis Sancağı, Halep Beylerbeyliği.*

## CANPOLATAN DYNASTY AND STATE BUILDING EXPERIMENT
## ELI PASHAYE CANPOLATZADEI

**Abstract:**

Kurds are the largest ethnic group in the Middle East after Arabs, Persians and Turks. It is known that the Kurds could not establish a new state after the Ayyubid State. It is known that some Kurdish dynasties continued their existence through tribal rule in various regions of Kurdistan. A significant part of these dynasties continued their rule with the status of yurtluk-ocaklık under the sovereignty of the Ottoman Empire after the Battle of Çaldıran (1514). One of these dynasties was the Canbulad Dynasty. Their center was the city of Kilis. Ali Pasha (1605-1607), the last member of this dynasty, seized the Aleppo Governorate by force. Also took Damascus under its sovereignty. He allied himself with Lebanese Sheikhs and Druze. The Ottomans could not prevent this Defacto governorship of Ali Pasha. Ali Pasha, who wanted to establish an independent state, wanted to establish diplomatic relations with some European states of that period and procure firearms from them. For Europeans, Aleppo was an important trade center.

The Ottomans understood Ali Pasha's intentions. At that time, the grand vizier of the Ottoman Empire was Kuyucu Murad Pasha. Kuyucu Murad Pasha stopped the war with the Europeans and the Safavids and began to take measures to thwart Ali Pasha's efforts to establish a state. Kuyucu Murad Pasha prepared the Ottoman army for the expedition and set out. He did not specify where he would go as far as the Taurus Mountains. It was thought that he was going against the Safavids. After passing the Taurus Mountains, he headed towards the Canbulat’s region. He conquered Tarsus and Adana, then went to war with Ali Canbulad's army in a narrow valley in the Amanos Mountains near Iskenderun. Canbulad's army consisted of sakban cavalry. There were firearms and hell balls in the Ottoman army. The horses were startled by the explosion of the cannons in the narrow valley. Ali Pasha's army was defeated.

Kuyucu Murad Pasha committed great massacres in Afrin, Cum Plain, Kilis and Aleppo after Canbulad's army was defeated.

Ali Pasha, whose army was defeated, went to Berriye (Urfa, Haran, Viranşehir and Ceylanpınar) to prepare a new army for him from the Milan tribes. We do not know exactly why, but there he changed his mind and went to Asitan (Istanbul). Ali Pasha appeared before the Ottoman Sultan Ahmed I (1604-1617) before Kuyucu Murad Pasha returned to Istanbul. Sultan Ahmed forgave him and appointed him governor of the present-day Romanian city of Timișoara. The people of the city and the janissaries did not accept this. Ali Pasha fled to Belgrade because of the tyranny of the janissaries. Ali Pasha Canbulad was executed here in 1611 by the order of Vizier Kuyucu Murad Pasha.

**Keywords:** *Canbulads, Canbuladoglu Ali Pasha, Kuyucu Murat Pasha, Kilis Sanjak, Aleppo Governorate.*